Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :429 nameronahi@gmail.com 08- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Penabar daxwaza sîstema hevseroktiyê dikin

Piştî serkeftina xebatên komîn û meclisan li kampa Holê ya penaberên Iraqê, penaber daxwaza sîstema hevserokatiyê dikin.

Li bakurê Sûriyê li ser bingeha netewa demokratîk sîstema hevserokatiyê li hemû saziyan pêk tê.

Li kampa Holê ya pengaberan jî di bin pêşengiya TEV-DEM'ê de xebatên rêxistinkirinê dewam dikin. Kampa Holê, tevî bi hezaran koçberên Sûriyê yên ku ji ber zilm û zordariya çeteyên DAIŞ'ê, komên çekdar û hêzên rêjîmê reviyane û her wiha ji bo pêşwazîkirina bi hezaran koçberên iraqî ku ji ber zilma DAIŞ'ê reviyane, hate vekirin. Kamp li rojhilatê bajarê Hesekê ye. Ji ber hejmara zêde ya koçber û penaberan, rêveberiya kampê bi koordîneya hin rûspiyên êlên Ereban, komîn û meclîs ji bo penaberan ava kirin. Penaberan xwest komîn û meclisên wan li ser heman rêgaza komîn û meclisên li Bakurê Sûriyê bin, lê rêgeza hevserokatiyê red kirin. Piştî biserketina komîn û meclisan û bi taybet xizmetên ku jinên iraqî li kampê pêşkêş kirin, penaberan daxwaz kir ku hilbijartinên nû li ser asta serokên komîn û meclisan pêk werin, lê vê care rêgeza hevserokatiyê bi cih bînin. Endamê rêveber ê Meclisa Kampa Holê ya penaberên Iraqî Şêx



Xidir Salih wiha got: "Ji ber ku em yekser bi rêveberiyê re têkildar in, derbarê kêmasiyên xedemî yan jî pirsgirêkên ku di navbera penaberan de rû didin, mafê me ye ku em mudexele bikin û ew jî bi rêya pêşkêşkirina daxwaznameyeke fermî ji rêveberiya kampê re pêk tê."

Her wiha Salih diyar kir ku ji ber rewşa ewlehiyê, destûr hatibûn sekinandin û wiha pê de çû: "Niha me ev pirsgirêk çareser kir. Meclîsa Iraqiyan û rêveberiya kampê di nav koordîneyê de ne. Meclis daxwaznameyan ji rêvberiya kampê re pêşkêş dike û li ser wê destûr tên dayîn."

Salih di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku ji ber serketina meclis û komînan, wan gelek daxwaznamyên penaberan ji bo ji nû ve hilbijartinan li dar bixin, lê vê carê rêgeza hevserokatiyê bi cih bînin, radestî rêveberiya kampê kirine. Endama rêveber a kampa Holê Silava Şêxo jî wiha got: "Ji ber zêdebûna hejmara penaberan û ji bo hêsankirina xebatê, me komîn û meclis li kampê ava kirin. Her komînek bi erkên xwe baş radibe. Xizmet bi rêya komînan ji penaberan re tê pêşkêşkirin." Silava Şêxo destnîşan kir rêveberiya kampê û meclisa Iraqiyan di nav koordîneyê de ne.

Di dawiya axaftina xwe de Silava Şêxo diyar kir ku di van demên dawîn de, meclisa Iraqiyan li kampa Holê, daxwaznameyek ji bo bicihanîna rêgeza hevserokatiyê pêşkêş kir; ji ber ku ew xebatê hêsantir dike û wiha got: "Em ê daxwaza penaberan ji bo hilbijartinên hevserokên meclis û komînan ên Iraqî di demeke kurt de bi cih bînin."...*ANHA*

# *Li Reqayê sewalkarî paş dikeve*







Komîteya Sewalkariyê ya Reqayê, bi armanca pêşxistina berhemên sewalkariyê plansaziyek daniye pêşiya xwe. Endama komîteyê Xedîce El-Abdullah banga pêşkêşkirina alîkariyê li rêxistinên mirovî kir.

Li Reqayê piştî çandiniyê sewalkarî tê. Piraniya şêniyên gundewarên Reqayê li gel çandiniyê sewalan xwedî dikin.

Komîteya Berhemên Sewalkariyê ya Reqayê erka pêşxistina beşa sewalkariyê girtiye ser xwe. Di vê çarçoveyê de rûxsetê dide beytaran. Lê derfetên kêm li pêşiya xebatên komîteyê dibin asteng.

Çeteyên DAIŞ'ê di dema ku Reqa dagir kiribû de amaborgo li ser şêniyan ferz kiribû. Xwediyên sewalan ji ber buhabûna êm û kêmbûna dermanên beytarî, sewalên xwe difirotin.

Li aliyekî din jî, çeteyan rêya Iraqê li ber qaçaxçiyên sewalan vedikir da ku li sûkên Iraqê sewalên wan werin firotin û rê dida bazirganên Iraqê derbasî Reqayê bibin û sewalan bikirin.

Di rewşa heyî de jî, sewalkarên Reqayê zehmetiyên kêmbûn û buhabûna êm, her wiha erzanbûna bihayê sewalan dikişînin. Ji ber ku sewalkarî girêdayî çandiniyê ye, pirsgirêkên ku di aliyê çandiniyê de derdikevin, bandoreke neyinî li sewalkariyê jî dikin.

Endama Komîteya Berhemên Sewalkariyê Xedîce El-Ebdullah diyar kir ku tunebûna dermanên ji bo aşîkirina çêlekan bandoreke neyinî li berhemên şîr kir û bang li rêxistinên alîkariyê kir ku alîkariyan pêşkêşî sewalkaran bikin.

Tevî kêmderfetan jî, komîteyê ji bo demên pêş plansaziyek daniye pêşiya xwe. Li gorî wê, hewl dide navendeke tenduristiyê û dermanxaneyeke beytarî veke û navenda aşîkirina sewalan li dijî nexweşiyan, saziya giştî ya êm çalakî bike. Komîte hewl dide hilberîna kurkan ne kêmî 150 hezar hêkan, bi taybet ku hilberîna Reqayê 200 hezar teyr e, zêde bike...*ANHA*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 429 08 - Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî


Îran wê timî di hedefê de be
*Zekî BEDRAN* **R-4**

Destanê Efrînê
*Medeni FERHO* **R-6**

## JI BO RÊBERÊ GELÊ KURD ABDULLAH OCALAN BILA HER KES BIKEVE NAVA TEVGERÊ

# DIBE KU SIBÊ DERENG BE

***Dewleta Tirk ya dagirker tecrîda girankirî ku daniye lis er Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û ev du sale nahêle malbat û parêzerên wî biçin Îmraliyê. Ev zêdeyî du salane ti agahî ji Ocalan nayê girtin. Fikarên Kurdan û malbata Ocalan ya derbarê jiyana Ocalan de roj bi roj zêde dibin.***



Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan şert û mercên tecrîda li ser Ocalan nirxand û got, "Li Îmraliyê pêkanînên ku ji şert û mercên tecrîdê wêdetir hene. Ev rewş bi tu awayî nayê qebûlkirin û divê pêşî gelê Kurd û hemû gelên Rojhilata Navîn ji bo ji holê rakirina tecrîda li Îmraliyê têbikoşin. Dibe ku sibê dererng be." ***R-4***

Xwîşka Ocalan Fatma Ocalan diyar kir ku ew dixwazin bi birayê xwere hevdîtinê bikin lê tên astengkirin û got, "Rewşa tenduristiya wî çawa ye em nizanin. Em dixwazin biçin Îmraliyê bibînin. Divê deriyên Îmraliyê werin vekirin. Ji bo hevdîtinê hemû serlêdanên me tên red kirin. Em ji jiyana wî bi fikar in." ***R-3***

Koordînasyona Kongreya Star bi daxuyaniyekê li ber navenda xwe ya bajarê Qamişlo Qonaxa Sêyemîn a Pêngava "Em ê Pergala Îmralî hilweşînin û bi Rêberê xwe re bi azad bijîn" ragihand. Kongreya Star bang li gel û jinan kir ku beşdarî çalakiyên ji bo azadiya Ocalan bibin. ***R-3***

# Em amade ne hêsîran veguhêzin




DAIŞ'ê di 25'ê Tîrmehê de êrîşî bajarê Suweydayê kir û bi dehan sivîlên Durzî ji bajar revand. Paşê jî li dijî welatiyên Durzî komkujî pêk anî. Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê di vê mijarê de daxuyaniyek da û diyar kir ku ew amade ne girtiyên DAIŞ'ê yên li cem hêzên wan bi sivîlên Suweydayê yên ji aliyê DAIŞ'ê ve hatine revandin veguhêzin û kesên hatine revandin vegerin malên xwe. ***R-2***

## HPG'ê SÎHA xist xwarê

Gerîlayên HPG'ê bi çalakiyên mezin derbên giran li artêşa Tirk didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiyên gerîla daxuyaniyek weşand. HPG'ê diyar kir ku gerîlayên wan li Şirnexê SÎHA'yek xistine xwarê û li herêma Barzanê leşkerek kuştine. ***R-2***

## Bazariyên ji bo avakirina hikûmeta nû

Li Iraqê nêzî 3 meh ji ser hilbijartina di 12'ê Gulanê de derbas bû lê ji bo avakirina hikumeta nû, hê jî hevdîtin tên kirin. Ji bo avakirina hikumeta nû bazarî tê kirin. Li başûrê Kurdistanê jî rewşa siyasî ne diyar e. Hilbijartinên ku tê payîn di 30'yê Îlonê de were lidarxistin tê gotin ku wê were paşvexistin. ***R-5***

## YPG li dijî leşkerkirina zarokan e



Berdevkê Fermî yê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) Nûrî Mehmûd derbarê rapora Human Rights Watch ku îdia dike YPG zarokên kampên koçberan bi çek dike, axivî û got, "Em li dijî bi çek kirina zarokane. Em amade ne bi kesên ku hewl didin rastiya li herêmê bi belge bikin, bibin alîkar. Em li gorî biryarên navdewletî yên girêdayî Neteweyên Yekbûyî tevdigerin." ***R-4***

## Ji bo vegera 5 milyon koçberan komîte hate avakin




Rêveberên Sûriyê, di encama hewldanên Rûsyayê de ji bo vegera nêzî 5 milyon koçber, komîteya hikûmetê ava kir. Li gorî nûçeya di ajansa SANA ya fermî ya Sûriyê de hatî parvekirin, hikûmeta Beşar El Esed, ji bo vegera koçberên derveyî welat komîteya bê avakirin erê kir. ***R-4***

## Xayîn bê ceza namînin: Ajan hat kuştin




Çalakiyên şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê li dijî xayîn, çete û dagirkeran berdewam dikin. Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê bi daxuyaniyekê ragihand ku wan xayînê bi navê Ekaş Hecî Ehmed ku sixûrtî ji dijminre dikir li gundê Dêr Sewanê kuştine. Odeya Çalakiyan careke din bang li kesên xayîn kir ku dev ji xuyanetê berdin. ***R-5***

## Leşker û çeteyên dagirker 9 sivîlên din revandin



Dewleta Tirk ku Efrîn dagirkiriye her roj kiriyarên xwe yên hovane lê didomîne. Çavkaniyên ji Efrînê ragihandin ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li gundê Badîna yê navçeya Mabata 9 sivîlên din revandin, yek ji wan jin e. ***R-2***

## DYA'yê dest bi zextên li ser Îranê kir

DYA dîsa dest bi zextên li ser Îranê kir. Wezîrê Karê Derve yê DYA'yê Mîke Pompeo diyar kir ku li ser daxwaza Serokê DYA'yê Donald Trûmp Qesra Spî vê dest bi zextan li ser Îranê bike. Elmanya, Fransa û Îngîltereyê daxuyaniyeke hevpar dan û diyar kirin ku destpêkirina zextan wan dixe nav fikaran. ***R-2***

# Em amade ne hêsîran veguhêzin

**_DAIŞ'ê di 25'ê Tîrmehê de bi dehan sivîlên Durzî ji bajarê Suweyda yê Sûriyê revand. Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) daxuyanî da û diyar kir ku ew amade ne girtiyên DAIŞ'ê yên li gel hêzên wan bi sivîlên Suweydayê yên ji aliyê DAIŞ'ê ve hatin revandin veguhêzin. "_**




Fermandariya Giştî ya QSD'ê diyar kir ku ew amade ne çeteyên DAIŞ'ê yên li gel hêzên wan bi sivîlên Suweydayê yên ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hatine revandin veguhêzin.
Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) daxuyanî da û diyar kir ku ew amade ne girtiyên DAIŞ'ê yên li gel hêzên wan bi sivîlên Suweydayê yên ji aliyê DAIŞ'ê ve hatin revandin veguhêzin.
Di daxuyaniya Fermandariya Giştî ya QSD'ê de wiha hate gotin: "25'ê Tîrmehê, rêxistina terorîst a DAIŞ'ê êrîşî bajarê Suweyda yê Sûriyê kir. Sivîlên Durzî hedef girtin. Paşê jî komkujiyeke hovane kirin û bi dehan sivîl ku piraniya wan jin û zarok in, revandin.
Em wekî Hêzên Sûriya Demokratîk baweriya me bi yekîtiya hemû gelên Sûriyê tê, em ji gelê xwe yên li Suweydayê û malbatên kesên hatine revandin re diyar kirin ku em amade ne girtiyên DAIŞ'ê yên li gel hêzên me, bi sivîlên Suweydayê yên ji aliyê DAIŞ'ê ve hatin revandina veguhêzin, da ku kesên revandî vegerin malên xwe."

## Ji bo Ocalan çalakiya birçîbûnê




Ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û bi dawîkirina dagirkeriya Tirk a li Efrînê, li Yunanistanê çalakiya greva biçîbûnê hate destpêkirin.
Li gelemperiya Ewropayê di çarçoveya kampanyaya ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û bi dawîkirina dagirkeriya dewleta Tirk a ji 20'ê Çileyê ve ya li ser Efrînê, standa çalakiya greva birçîbûnê hate destpêkirin.
Çalakiya greva birçîbûnê wê ji 6'ê mehê heta 11'ê Tebaxê berdewam bike. Di roja yekem a çalakiyê de ber bi Sefaretxaneya Tirk ve meşeke girseyî hate kirin.
Di axaftinên çalakiyê de hate kirin, bal kişandin ser rola dewletên Ewropa ya li ser komploya navneteweyî ya li ser Ocalan û hate bibîr xistin ku nêzî 20 sal in Ocalan di bin tecrîdê de ye.
Her wiha di çalakiyê de bêdengiya welatên Ewropa ya li hember dagirkeriya Efrînê jî hate şermezarkirin. Çalakiya greva birçîbûnê li Qada Syntagamê dewam dike.

## DYA'yê dest bi zextên li ser Îranê kir



DYA dîsa dest bi zextên li ser Îranê kir. Yekîtiya Ewrûpayê jî nerazîbûn nîşan da û diyar kir ku ew ê li gorî peymana nukleerê tevbigerin.
Wezîrê Karê Derve yê DYA'yê Mîke Pompeo diyar kir ku li ser daxwaza Serokê DYA'yê Donald Trûmp Qesra Spî vê Duşemê dest bi zextan bike.
Trûmp di meha Gulanê de biryar dabû ku xwe ji peymana nukleer a di Tîrmeha 2015'an de ya li Viyanayê vekişîne. Peymana nukleeer di navbera DYA, Rûsya, Çîn, Fransa, Îngîltere, Elmanya û Îranê hatibû îmzekirin. Zexta pêşîn a li ser Îranê vê Duşemê hat destpêkirin.
Nûnera Polîtîkayên Derve ya Yekîtiya Ewrûpayê Federîca Mogherînî tevî Wezîrên Karên Derve yên Elmanya, Fransa û Îngîltereyê daxuyaniyeke hevpar dan û diyar kirin ku destpêkirina zextan wan dixe nav fikaran.
Welatên Yekîtiya Ewrûpayê diyar kirin ku ew amade ne aktorên ekonomîk biparêzin ên ku têkiliyên bazirganiyê yên meşrû bi Îranê re danîne.
Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku zagona antî-boykot a Yekîtiya Ewrûpayê ji bo parastina şîrketên Yekîtiya Ewrûpayê yên ku bi Îranê re bazirganiyê dikin ew ê di 7'ê Tebaxê de têkeve meriyetê.


## Li Endonezyayê hejmara miriyan bû 142



Li girava Lambokê ya ku li başûrê Endonezyayê ye, roja Yekşemê bi pileya 6,9 erd hejiya. Hejmara kesên jiyana xwe ji dest dayîn bû 142.
Li Girava Lombok roja Yekşemê erd hejiya. Piştre jî gelek erdhejên paşbir çêbûn. Li gorî ajansa Elmanya DPA'yê 142 kesan jiyana xwe ji dest dane. Li herêmê 1200 turîstên biyanî hatin tehliyekirin.
Piştî erdhejê hişyariya tsûnamiyê hate dayîn û ev jî bû sedema panîkê. Berdevk got; "Mirov di nava panîkê de bûn, bi taybet ji ber hişyariya tsûnamiyê." Şopên tsûnamiya sala 2014'an ku bûbû sedema mirina 16 hezar kesan hê jî di hafizaya hemwelatiyên herêmê de ye. Hate diyarkirin ku mirinên ji ber erdheja Lombokê zêdetir li herêmên çiyayî çêbûne.
Beriya hefteyekê li rojhilatê Baliyê li heman giravê erdhej çêbûbû û 17 kesan jiyana xwe ji dest dabûn. Di erdheja li Lambokê de bi sedan avahî hilweşiyabûn.

## HPG'ê SÎHA xist xwarê

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiyên hêzên gerîla li ser malpera xwe ya fermî daxuyaniyek weşand. HPG'ê diyar kir ku gerîlayên wan li Şirnexê SÎHA'yek xistine xwarê û li herêma Barzanê leşkerek kuştine.
Di daxuyaniya HPG'ê de ev tişt hate diyarkirin:
"Di 19'ê Hezîranê saet di 15.30'an de li Şirnexê hêzên me li dijî SÎHA'yê (Wesayîta hewayî ya bêmirov a çekdarî) ya ku dixwest xwe deyne balefirxaneya Şerafettîn Elçî çalakiyek li dar xistiye. Hêzên me li vê SÎHA'yê dane û SÎHA xistine xwarê. SÎHA di navbera gundê Hoser û navçeya Hezexê de ketiye xwarê û ji hev belav bûye. Piştî çalakiyê artêşa Tirk a dagirker li qadê operasyonek daye destpêkirin. Ev operasyon di 22'ê Hezîranê de bêyî ku encamê werbigire, bi paş ve hatiye kişandin.



Di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de hêzên me di 6'ê Tebaxê saet di 03.20'an de li dijî artêşa Tirk a dagirker ya li Girê Bayrak a herêma Barzanê ya Başûrê Kurdistanê çalakiyek li dar xistiye. Di vê çalakiyê de leşkerek hatiye kuştin.

## Çeteyên dagirker li Efrînê 9 sivîlên din revandin



Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li gundê Badîna yê navçeya Mabata ya Efrînê 9 sivîlên din revandin ku yek ji wan jin e.
Li Efrînê ya ku ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve hatiye dagirkirin, êrîşên hovane li dijî gelê Kurd didomin. Çavkaniyên ji bajar ragihandin ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li gundê Badîna yê navçeya Mabata ya Efrînê 9 sivîlên din revandin ku yek ji wan jin e.
Navê sivîlên hatine revandin wiha ne; Nîhad Umer (40), Hisên Şaban (25), Reşîd Cibalî (27), Hesen Cafer (45) Mewlîda (50), Hemûda Eşkîle (44), Mihemed (26), Xesan Dado (40) ve Hebeş Hebş (25).



# Doza kurd herdem di rojeva min de bû

**_Pirtûka nivîskar û rojnamevanê Kurd Hesen Zaza ya bi navê "Rola kurd di avakirina Misir û Şamê de" berê demekê hate çapkirin. Nivîskar di pirtûka xwe de bi berfirehî cih daye dîroka Kurdên li Misir û Sûriyê._**


**Melek DEMÎRTAŞ**

Hesen Zaza Nivîskar û Rojnamevanê kurd di sala 1950'î de li Dîmeşqê bajarê Rikne Dîn ji dayîk bûye, di nav malbatek kurd welatparêz de mezin bûye û bi temenê 17 salî de dest bi nivîsandina helbestan kir. Xwendina xwe heya zaningeha Şamê temam kir û dîplomeya Macistêra ragihandinê wergirtiye û ev 50 salin ku xebatê rojnamevanî û nivîskariyê dike, her wiha di gelek rojname û malperanên herêmî û biyanî de wekî edîtor xebat kiriye.
Di sala 1993'yan heya 1997'an de wekî endamê Mecils parêzgeha Dîmeşê hate hilbijartin, di heman demê de jî yek ji sazkarê mihrîcana Dîmşeqê ya çandê û şanoya cîhanê di Sûriyê de bû. Hesen Zaza di di şoreşa Rojava jî yek ji avakerên YRA'ê bû ku Endamên Rêvebirê Yekîtiya Ragihandina Azad bû û niha jî endamê Meclisa Zagonsaz a Herêma Cizîrê ye. Heya niha 2 kom nivîsên helbestî û 5 pirtuk ser mijarên siyasî, doza kurd û civakî nivîsandiye, yek ji wan pirtûkan jî "Rola Kurd di avakirina Misir û Şamê de ye."
Rojnameya Ronahî derbarê pirtûka bi navê " Rola Kurd di avakirina Misir û Şamê de." Ser armanc û naveroka pirtûkê bi Nivîskar û Rojnamevan Hesen Zaza re hevdîtin kir

### *Kengî dest binivîsêkir û çima doza kurdî bala te kişand?*

Ez ji malbatek kurd û welatparêz de mazinbûme, Ez kurdim ji bo wê jî doza kurdî ji bo min mîna nanê rojane, her di rojevê de bû. di sala 1967'an ku di temenê 17 salî debûm bi helbestan dest bi nivîsêkir û du komkirinê helbestên siyasî û rexnegerî bi navê "Cîhana sêyemîn" nivîsand. Di navbera van salan de xebatê rojnamevaniyê de jî min girîngî da nivîsandinê ku ez wek kurd bi sedên salan ji mafê xweyî rewa mherum mame, her wiha mala her ji tevgerên azadiyê re vekirîbû û hîn vekiriye, bapîrê min tirka ew kuşt."

### *Heya niha te çend pirtûk nivîsye?*




Heya roja îro 5 pirtûkên wekî "Tevgerên Siyasî di Sûriyê de, Hukumeta Sûriyê de sed sala 20'an de, Iraq lêkolîna siyasî û rêxistinî, pêşxistina dîokratiyê û Rola kurd di avakiirna Misir û şamê de " nivîsnad û çabkiriye û 1000 hijmar hatin çapkirin û li tevahî Sûriyê û heya Qahîrayê hatiye belavkirin. Naveroka wan jî ser rêvebirên kurd di dema avakirin û şoreşa di Sûrî de, ku di wê demê de yên ku sûriyê bi rêvedibirin kurd bûn. Di sala 2007'an de pirtûka bi navê "Iraq Lêkolîna di dîroka siyasî ji partî û rêxistinan" de di wê pirtûkê de jî min bal kişand ser doz kurd di Iraqê de û taybet ser kurdewariya Kerkûkê. Armanc ji van pirtûkan da ku cîhan û taybet rewşenbîrên Ereb û biyanî rol, çand û dîroka kurdan nasbikin, pitûka herî dawî "rola kurd di avakirina Misir û Şamê de bû."

### *Naveroka pirtûka nû çiye û bi armancê te nivîsandiye?*

Pirtûka "Rola kurd di avakirina Misir û Şamê de" rewşek cûda çêbû ku di sala 2017'an de çapa yekemîn ji pirtûka rola kurd di avakirina Misir û Şamê de li Akadimiya Lêkolînên Kurdî li Qahîra yê hate çapkirin, her wiha li pêşngeha pirtûkan a Qahîra hate pêşkêşkirin û eleqeyek mezin jî dît, her wiha di sala 2018'an de li Rojava hate çapkirin û di 2.pêşngeha pirtûkan a Rojava ku beriya demekê li Qamişlo hatibû li darxistin hate belav kirin. Rastî ji bo ku bighêje pêşngehê tanî 150 pirtûk hatin çabkirin, lê heye niha di çapê de wê 1000 hijmar bêne çabkirin. Di pêşngehê de xwîneran eleqeyek mezin danê de û nêzî 50 pirtûk li wan hate belavkirin. Ev pirtûk mîna pirtûkên din ser doza kurde lê, vê carê bi rengekî ferhtir. Demek direj bû ku min ser lêkolîn dikir, jiber ku di deme berê de gelek rêvebirên kurd mîna Nurdîn Zaza û Osman Sebîrî mêvanê mala me bûn û nîqaşên ser doza kurd dihate gûtebêjkirin. wekî kurd normale û ji xwezaye ku girêdan min bi doza kurdî hebe û balê bikşînim ser, di nivîskê xew de min kurdistan nivîsî tenê ji bo vê gotinê; Rêjîma Baas ez xistim girtîgehê de û kurê min yê bi navê Heval jî girtin, di encama işkenceya Basiyande jiyan xwe ji dest da. Armanc ku dîroka kurd di rêvebirin û avakirinê de ji cîhanê re bidim nasî û tola xwe lawê xwe di riya vê pirtûkê de hilînim."



### *Naveroka pirtûkê ser 6 werzane her werzek behsa çi dike?*

Ev pirtûka ser 6 werzane her werzek mijarek digre dest wekî "Rola kurd li Sûrî, Libnan, Misir, rol kurd di şorşa Sûrî de û rola ciwanên kurd di dagirkeriya firensî li Sûrî de û li Filîstînê jî ...hwd. Ev kesên ku di avakikirina Misir û Şamê de xwedî rolbûn mîna (Ibrahîm Henano, Yûsiv El-ezma û mhmed Mela...hwd. Ku di sala 1939'an de ciwanên kurd li Sûriyê yaneya çanda kurdistan li şamê wekî Ehmed keftaro, Alî Bozo, Nûridîn Zaza û D.Xalid Qotreş avakirin, dema ku rêjîm yane girt li şûna wê Yaneya Werzêş bi navê "Kurdistan" vekirin. Ev pirtûk wekî belgeyên piştrastkirî ji bo danesîna rola gelê kurd di rizgarkirin û avakirina Misir û Şamê de, her wiha avakirina jiyanek siyasî, çandî, civakî û aborî de xwedî rolek girînge."

### *Çi projeyên te hene?*

Projeyên nû dê pirtûka "Rola kurd di avakirina Misir û şamê de" di çapa sêyemîn wê ser rola rojnamevanên kurd di ragihandina Misir û Sûriyê de ku yekemîn jina kurd li Misrê derbasî zaningehê de û dibe yekemîn jin bawernameya doktora li zaningehê werdigre navê wê jî Suhêr El mawîyê ye. Di heman demê de jî hazirtiya pirtûka nû ser Êzîdxaniyan dikim, ku ev 35 salin ser lêkolîn û mijûlê dibim, her wiha pirûka "Pêşxistina dîrokî ya dîmokratîk jî di çapê de ye."

## Hunera şoreşgerî rastiya çanda me ye

**Idrîs HENAN**

Şêwekarê pispor Erdelan Îbrahîm ku nêzî 30 salî li diyasporê bû, bi Şoreşa Rojava re berê xwe da Efrînê. Li wir jî demildest tevlî nava xebatên hunerî dibe û cihê xwe weke Endamê Têkîliyan di Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê de digire. Îbrahîm beşdarî gelek xebatên mîna wêneya Rêbertiyê ya li Bilibê, peykera Kawayê Hesinkar û gelek çalakiyên dîtir ên kantonê dibe.

### ERKA ME ŞERVANTÎ YE

Îbrahîm li ser rola hunermend û rewşenbîran di yekemîn qonaxa Berxwedana Serdemê de ev tişt got: Rola rewşenbîr û hunermendan di kêliyên dîrokî de ne kêmî rola şervanan e. Me jî di nav berxwedana gelê Efrînê de xwe birêxistin kir. Bi koordîneya bi gelek saziyan re (Heyva Sor a Kurd, meclîs û komînan, saziyên rêveberiyê,…hwd) me berê xwe da çeperên berxwedanê. Me ji gel re civîn li dar dixistin. Alîkariya tubî li çeperan, bicihkirina şêniyên gundan, dabînkirina pêdiviyên gel û … hwd. Erdelan tekez dike ev kar erkekî me yê neteweyî bû û got: Ji bo ku em rastiya van êrişan bi gel û cîhanê re bidin nasandin, şêwekarên Efrînê li ser dîwarê Paymangeha Viyan Amara wêneyên ku vê rastiyê diteyisînin xêz kirin.

### LI HERDU KAMPAN FÊRGEHÊN WÊNEXÊZIYÊ

Erdelan Îbrahîm li ser qonaxa piştî koçberiya bi zorê li Şehbayê dibêje: Mixabin em jimarek kêm li vir mane. Lê vê yekê bandor li îradeya me ne kir. Demildest me civînên xwe li dar xistin û ji nû ve em komî ser hev bûn. Me biryar girt ku di bin çi şert û mercan de be, ji bo rizgarkirina Efrînê pêwîste em bi rola pêşeng rabin. Îbrahîm destnîşan kir ku ên herî zêde bi vê êrişa dagirkeriyê bandor bûne zarokin. Derûniya wan li ber têkçûnê bû. Ev jî ji hinek derdoran re zemîneke êrişên çandî amade dikir. Ji ber vê yekê, berî her tiştî me berê xwe da zarokê Efrînê û ji bo wan dibistanên fêrkirina şêwekariyê li herdu kampên Berxwedan û Serdem hatin vekirin.

### ENERJIYA ZAROKAN DÊ BITEQE

Îbrahîm di nav axaftina xwe de got: Zarok bi riya hunerê dikare derûniya ku dijmin avakiriye derbas bike û berovajî hêviyên dagirkeran dikare bibe volkanek û di rûyê dijmin de biteqe. Lê pêwîst bû em vê enerjiya zarokan bi riya hunerê di tunelên rast ên Şoreşa Rojava de biherikînin. Armanca me ya sereke jî ew bû ku em civaka xwe di nav van şert û mertên dijwar de ji nû ve bi rêxistin bikin. Ji ber jî, di serî de me zarok hedef girtin. Îbrahîm dewam dike: Ji bona ku ev kar bi rêkûpêk bibe bi Çand û Hunera Efrînê û Yekîtiya Rewşenbîran re em ketin nava têkîlî û koordîneyê.


### WÊNEYÊN VEGERÊ XÊZ DIKIN

Îbrahîm dibêje: Destpêkê de hejmara zarokên li fêrgehan ne digihaşt 20 zarokan. Lê niha li her fêrgeheke me bi qasî 75 zarokên temen navbera 6 û 14an de hene. Ev hejmar rojane jî zêde dibe. Îbrahîm diyar kir ku destpêkê ew dersên derûnî didin û ev tişt anî ziman: Piştî dersên derûnî em zarokan fêrî wênexêziyê dikin. Îbrahîm derbarê wêneyên ku zarok xêz dikin de jî got: Zarokên me wêneyên veger, bîrî, zeytûn, berxwedan, koçberî, balefir, sewal, ax, gund, pez, çiya û … hwd bi giranî xêz dikin. nameya wan jî ew e ku dunya hemû bizanibe ku gelê Efrînê girêdayî axa xwe ye û nikare li dûrî çanda xwe yek rojê jî bijî.

### PROJE PIR IN

Erdelan Îbrahîm derbarê giştî kar û projeyên xwe de ev tişt got: Gelek projeyên me ji bo zarokan hene. Hinek jê pêk hatin, hinek di dewrê de ne û hinek jî wê pêk werin. Projeya me ya Moreka Êşê jî hîna di dewrê de ye. Di vê projeyê de wê bi hezaran zarokên Efrînê moreka xwe lêdin û dê nameyekê ji hemû zarokên dunyayê re, bi riya wênexêziyê bişînin. Tabloya Moreka Êşê wê bibe mezintirîn depoya hunerî li dunyayê. Dê bi riya wê jî zarokên me rastiya dagirkeriyê rave bikin.

### EM XWEDÎ ERKÊN NETEWEYÎ NE



Şêwekar Erdelan Îbrahîm di dawiya axaftina xwe de got: Pêwîste hinermend û rewşenbîrên Kurd û bi taybet ên Efrînê xwe di vê qonaxa hestiyar de xwedî erk û peywirên neteweyî bibînin. Em ê di nava vê heyama serfeberiyê de bi nîgar û resmên xwe rastiya hov û qirker a dewleta Tirk ji dunyayê re ragihînin. Pêwîste li gorî pêvanên şoreşê û rastiya Kurd, kesayeta hinermendê şoreşger ava bibe. Ev jî ancax bi rola pêşeng a hunermend û rewşenbîran pêkan be.

# Oldaran ji bo Ocalan bang kirin

**Oldarên bajarê Hesekê yên ku beşdarî Komxebata Îslama Demokratîk bûn, tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin. Oldaran diyar kirin ku tecrîda li ser Ocalan tecrîda li ser hemû gelan e û bang li saziyên mafên mirovan kirin ku ji bo eşkerekirina rewşa Ocalan têkoşînê bikin.**




Oldarên bajarê Hesekê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin û tecrîd wek kiryareke li dijî nirxên mirovahiyê û gelan nav kirin.
Oldarên bajarê Hesekê yên ku beşdarî Komxebata Îslama Demokratîk bûn, tecrîda li ser Ocalan şermezar kirin û bang li saziyên hiqûqî yên mafên mirovan kirin ku ji bo rewşa tendurustî û azadiya Ocalan bixebitin.
Endamê Yekitiya Oldaran Şêx Ednan El-Ilîwî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir, di heman demê de wek tecrîda li ser mirovahiyê bi nav kir û wiha got: "Dîlgirtina Rêbertî encamên komployeke navdewletî ye, gelê kurd bi têkoşîna wî serbilind e."
Şêx Ednan anî ziman ku dewleta tirk a ku banga îslamê dike, tu girêdana wê bi îslamê re tune ye û wiha dewam kir: ″Qurana pîroz banga mafên dîlgirtiyan dike. Lê AKP vê yekê paşguh dike. Li aliyekî din jî mafê gelê kurd e ku rewşa rêberê xwe nas bike, ji ber ku Rêbertî nûneriya gelê kurd dike. Ya ku dewleta Tirk dike ji hemû gelên cîhanê zilmeke.″
Endamê Yekitiya Oldaran Şêx Ebû Enwer EL Qadirî li Hesekê bêdengiya rêxistinên navdewletî ya têkildarî rewşa Ocalan şermezar kir û wiha got: ″Ocalan mîmarê aştî û mirovahiyê ye, banga wî rizgarkirina gelên bindest e, ne tenê gelê kurd e.″
Şêx Qadirî destnîşan kir ku rêxistinên banga azadiya gelan dikin erka xwe bi cih naynin û ev tişt anî ziman: ″Bi saya fikrên neteweya demokratîk a Rêber Abdullah Ocalan gelên Bakurê Sûriyê bûne yek.″
Şêx Ebû Enwer El Qadirî di dawiya axaftina xwe de bang li gelê kurd û gelên bindest kir ku li hemberî siyasetên AKP'ê bisekinin, her wiha bang li rêxistinên navdewletî û rêxistinên mafên mirovan kir ku ji bo eşkerekirina rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bixebitin…*ANHA*

# Li Girê Sipî pirsgirêka sotemeniyê




Ji ber kêmbûna madeyên sotemeniyê li kantona Girê Spî welatiyên herêmê zehmetiyan dikişînin. Ji ber vê yekê welatiyan giliyên xwe li şaredariyê kirin. Şaredariyê jî soza çareserkirina pirsgirêkê da.
Li kantona Girê Sipî di demên dawîn de madeyên sotemeniyê kêm bûne. Di encamê de bandoreke neyînî li jiyana rojane ya welatiyan bûye.
Bi taybet di van demên dawîn de ji ber bilindbûna pileyên germahiyê û kêmbûna avê ku bi rêya jeneratoran ji bîran tê belavkirin, rewş dijwartir bûye.
Girêdayî mijarê welatiyê bi navê Hisên Elî diyar kir ku saetên ceyranê hatine kêmkirin û ji ber vê yekê rewşa wan di van rojên havînê de dijwartir bûye.
Welatiyê bi navê Kerîm Mihemed jî girêdayî heman mijarê wiha got: "Ev çend sal e em ji ceyranê bê par in. Bi armanca peydakirina kehrebeyê jenerator hatin peydakirin û ev jenerator jî tenê çend saetan kehrebeyê ji welatiyan re peyda dikin. Ev jî girêdayî pirsgirêka peydakirina sotemeniyê ye."
Ji ber aloziya peydakirina sotemeniyê tevgera hatinûçûnê di bajêr de gelekî kêm bûye.
Ajokar jî bi saetên dirêj li pêşiya benzînxaneyan kom dibin da ku wesayîtên xwe dagirin.
Ajokarê bi navê Îsmaîl Mihemed diyar kir ku ew di van demên dawîn de ji ber aloziya peydakirina sotemeniyê rastî gelek astengiyan tên û bandoreke neyînî bi karê wan bûye.
Ji ber van pirsgirêkan welatiyan giliyên xwe li aliyên peywendîdar kir da ku pirsgirêk di demeke lezgîn de were çareserkirin û sotemenî ji herêmê re were peydakirin.
Girêdayî mijarê endamê Rêveberiya Komîteya Sotemeniyê ya Kantona Girê Spî, Mistefa Îbrahîm wiha got: "Miqdara sotemeniyê ku ji herêmê re tê kêm e û di encamê de bandoreke neyînî li welatiyan bû. Em bi aliyên têkildar re di nava peywendiyan de ne da ku pirsgirêk were çareserkirin û van aliyan jî soz da ku di demeke nêzîk de madeyên sotemeniyê li gorî tê xwestin peyda bikin."…
*ANHA*

# Bi zêdebûn germê rewşa koçberan jî zehmet buye



Koçberên kampa Ebû Xeşeb ji ber bilindbûna pileyên germê di warê jiyanî de zehmetiyan dikişînin.
Welatiyên koçber yên li a li kampa Ebû Xeşeb a Dêrazorê hatine bicihkirin ji ber kêmbûna pêdiviyan û bilindbûna pileyên germahiyê bi pirsgirêkên jiyanî re rû bi rû ne. Her wiha ji ber ku dîwarekî kampê biparêze tune ye û kamp li ser axê hatiye avakirin, kamp di nava tozê de dimîne û navendên tenduristiyê di kampê de bi şevê tune ye.
Ji ber kombûna tozê di hundirê kampê de mar û dûpişk jî zêde bûne. Ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê jî ti derman li kampê de nehatine reşandin.
Girêdayî mijarê koçberê bi navê Ednan Elî ku ev 5 meh in di kamê de dimîne wiha got: "Beriya çend mehan me ji rêveberiya kampê xwest ku konên çiriyane biguherînin, lê heta niha daxwaza me nehatiye bersivandin. Her wiha di kampê de pirsgirêka ava vexwarinê jî heye û ava paqijkirinê gelekî kêm e. Di kampê de derman gelekî kêm in. Em bang li rêxistinên mirovî dikin ku alîkariyê bidin me."
Koçbera bi navê Xaliya El-Salih jî axivî û destnîşan kir ku derman û şîrê zarokan gelekî kêm e û diyar kir ku di kampê de gelek astengdar hene, pêdiviya wan bi dermanan zêde ye.
Kampa Ebû Xeşeb li gundewarê Dêrazorê di 13'ê Tîrmeha sala borî de hatiye avakirin. Di kampê de 495 kon hatine vegirtin û 2664 koçber lê hatine bicihkirin…*ANHA*



## Destanê Efrînê

Medeni FERHO

Min pirtûkêk nivîsî.
Ez bi çavekî din li cîhanê dinêrim, nîgarkêşiya min Kurdîtopya ye!....
Her şoreş bi çirîskekê dest pê dike... Civîna li Enqerê, 4 derbikên kûfrîta li Zindana Amedê, 15ê Tebaxê, bûne çavkaniya Kurdîtopya. Berxwedana Efrînê jî hêlan e, qiyam e, qiyama li Efrînê Bîg Bang e û dewam dike!... Lehengên di berxwedanê de yarên bûn, yarenên dîrokê!...
Her pirtûk "tefekkûr"ek e!..Akûmûlasyon e!.. Sahîh e û "tefekkûr e", tefekkûr karekî rewşenbîrî ye!..
Sahîh e: Civîna li Enqera nebane, akûmilîsyona Kurd ya modern jî çênedibû.
Berxwedana Efrînê Bîg Bang e!... 58 rojên, ji 13,505 rojan e!... 37 sal x 365= 13.505 roj!.. Big Banga mezin, di cîhana Kurdan de, 15ê Tebaxê ye!.. Bû kêşe û dewam dike!.. Êdî ocax e, oxax bi pirtûk e.
Û min pirtûkek nivîsî!..
Ev pirtûk, agirê Bîg Bangê ye, paletî jî dewam dike!..
Destanê Eferînê.. Yan jî Dastana Efrînê.. Yan jî Destan-i Efrîn!..
Û ez li cîhanê cûda dinêrim!... Efrîn pencereyek e, di avaniya Kurd de, asoyên paşerojan dide xuya kirin. Ev pencere Qendîl e...
Dubare dikim, her pirtûk pencereyek e. Her pencere neynikek e!... Kultur e "dast-destan" wiha ye!... Dast, yekemîn car di Zend Avesta de hate bikaranîn. Zanist e, piştre bû destan, bû çavkaniya dîrokê.
Hêrs û têkoşîna li dijî xezebê ye. Tirkiye xezeb e, terîqata dewişrmeyan e!. Lehengî û lewendiya ciwanmerdî û şahlewendiya li dijî vê terîqata xezebê heye. Vê jî, xasbahçeyê Kurd û Kurdistanê rengîn kiriye; 37 sal in, 13.505 roj in, bi xwînê rengîn dibe!...
Min piretûkek nivîsî!..
Û li cîhanê cûda dinêrim... Paletiya Destanê Efrînê, çalekiya dîrokî ya Avesta Xabûr e... (28ê Çile '18) Bê navber, 6 mehan dewam kir... Çapkirina pirtûkên Kurdî jî serguzeştek cûda ye, lê min bi copy 12 pirtûk derxistin. Ev jî bû restorasyona mêjiyê min û berxwedana bedena min û mixabiniya weşangeriya Kurd e!..
Copy jî be, min got, ev pirtûkek e, hem nivîsandin, hem sergûzeşta çapê, cûda dîrok in!...
Dubare dikim; eger 15ê Tebaxê nebane, "Destanê Efrînê", yan jî "Romana Kobanê" dernediketin holê!.. Û meyda Kurd, ajansên Kurd li holê nînin!..
Dubare dikim; divê Şoreşa Rojava, di aliyê kulturî de teqînekê çêbike. Kultur pirtûk e!..
Lê û mixabin rewşenbîriya Kurd, rojnamevaniya Kurd, di palûteya Bîg Bangê de lewaz in, qels in!..
Destanê Efrînê, çavdêriya Bîg Bangê ye, îddîayek mezin e!... Ji mîrekîtiyan, heta bi enternasyolistan, dilop bi dilopa xwîn û xwehdan e, hestê agir-î dil hunandina gotinan e... Nîgarkêşiyek epîkî ye û mecburiyetek e. Ev mecburiyet "mahkumiyeta" hemû nivîskarên kurd e.
Nivîskarên kurd "pek tirsonek" in. Pêşî ji xwe ditirsin û tirs mezin dibe. Her behane jî nîşaniya vê tirsê ye!..
Min pirtûkek nivîsî û dibêjim;
Bîg Banga Kurdistanê, aveniyek ava kiriye; çar aliyên wê cem e, kişûmat cîhan, hem xuya dike, hem dibîne. Ez jî di vê penceraya avaniya Kurd de dinêrim, dibînim û min pirtûkek nivîsî.
Dastan, nêr e, mê ye, destan e, dastan e, ne giring e. Ev gotin şaş e, ev rast e!.. ne bi gotinê, bi nivîsê sererast dibe. Nivîs mayînde ye, pencere ye, û "kamilbûn" e!... Şaşî, bi nivîsan rast dibin.
Gotina dawî; di tevahiya dewşîrmeyan de "sadiqî-sadaqat" nîne. Diyalektîka jiyanê wilo dibêje!.. Kesên ku sadiqi-sadaqata wan nebê nikarin bibin millet. Tirk, sed sal in nebûne millet... Bûne dewlet lê hîna li milletbûnê digerin!... Çîmentoya dewletbûna wan "sêve sor e, kevir li ser kevir, serî li ser bedenê ne hêle" ye. Kerasat û belengaziya sedsalê ye!..
Min pirtûkek nivîsî
Pirtûk, "Destanê Efrînê" ye û ji her prtûka dinivîsim jî heyecanê digirim. Her pirtûk, çavdêriya dema xwe dike. Destanê Efrînê neynika vê demê ye!..



# Em ji jiyana Ocalan bi fikar in

***Fikarên gelê Kurd yên derbarê jiyana Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de her diçe zêde dibin. Xwîşka Ocalan Fatma Ocalan diyar kir ku ew dixwazin bi birayê xwere hevdîtinê bikin lê tên astengkirin û got, "Rewşa tenduristiya wî çawa ye em nizanin. Em ji jiyana wî bi fikar in."***



Fatma Ocalan diyar kir ku ji bo bi birayê xwe re hevdîtinê bikin her carê serî lê didin û rastî her cureyê zehmetiyan tên û got: "Rewşa tenduristiya wî çawa ye em nizanin. Em ji jiyana wî bi fikar in."
Ji ber tecrîda li Girtîgeha Îmraliyê pêk tê ji 27'ê Tîrmeha 2011'an heta niha Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi parêzeran re nikare hevdîtinan bike û herî dawî di 11'ê Îlona 2016'an de bi birayê xwe Mihemed Ocalan re hevdîtin kir. Parêzer ji bo hevdîtinê 777 caran serî li dan û bi hincetên 'pûç û vala tê redkirin.
Birayê Abdullah Ocalan, Mehmed û xwişka wî Fatma Ocalan ji bo biçin Îmraliyê bi hevkariya parêzerên xwe 87 caran serî li Serdozgeriya Komarê ya Bursayê dan û dîsa bi heman hincetan hat redkirin.
Xwişka Abdullah Ocalan, Fatma Ocalan destnîşan kir ku ev 4 sal e bi birayê xwe re nikare hevdîtinê bike û wiha got: "Em nizanin rewşa tenduristiya wî çawa ye. Em ji jiyana wî bifikar in. Ji bo ev fikar ji holê rabin divê deriyê Îmraliyê vebe. Hemû serlêdanên me tên redkirin."
'Xwarziya Abdullah Ocalan, Elîf Ocalan jî daxuyakirin ku divê hevdîtin ji nû ve bên destpêkirin û ev tişt anî ziman: "Em dixwazin bi serokatî re dîsa hevdîtin bên destpêkirin. Em wek malbat ji tenduristiya serok bi fikar in. Ji bo tecrîd rabe ez bang li hemû mirovan dikim ku bên gel hev. Di vî alî de divê çalakî pêk bên."

# Jinên ciwan amadekariya kongreyê dikin

Yekitiya Jinên Ciwan li Bakurê Sûriyê amadekariya lidarxistina kongreya xwe ya sêyemîn dike.
Tevgera Jinên Ciwan li Rojava di sala 2012'an de yekemîn kongreya xwe li dar xist û ya duyemîn jî sala 2016'an li bajarokê Rimêlan bi dirûşma "Berxwedana jinên ciwan mîsogeriya azadiya Apo û şoreşa Kurdistanê ye" pêk hat. Di encama kongreyê de navê tevgerê bû Yekitiya Jinên Ciwan a Rojava.
Yekitî piştî ku hemû amadekariyên lidarxistina kongreyê bi dawî kirin, hewl dide di rojên pêş de kongreya xwe ya sêyemîn li ser asta Bakurê Sûriyê li dar bixe.
Endama Rêveber a Yekitiya Jinên Ciwan a Kantona Cizîrê û Endama Komîteya Amadekar a Kongreya Sêyemîn a Yekitiyê Jîndar Munzur destnîşan kirin ku armanca wan ji lidarxistina kongreyê, birêxistinkirina jinên ciwan li hemû herêmên Bakurê Sûriyê ye.
Jîndar Munzur wiha axivî: "Bi sedan salan jin ji mafên xwe bê par mane, lê di nav Şoreşa Rojava de jin bi hemû hêza xwe hewl didin bigihîjin azadiya xwe."
Jîndar destnîşan kir ku ew hewl didin xebatên xwe zêde bikin da ku jinên ciwan bêtir xwe bi rêxistin bikin û nifşekî nû yê birêxistinkirî û rêgeza neteweya demokratîk ji xwe bingeh bigire. Jîndar diyar kir ku kongre bi dirûşma "Bi felsefeya Rêber Apo em ê dagirkeriyê têk bibin û bi rêveberiya jinên ciwan em ê Sûriyeke azad ava bikin" wê were lidarxistin.
Tê payîn ku nêzî hezar delege û 500 nûnerên kantonên Kobanê, Efrîn, Cizîr û bajarên Reqa, Tebqa û Dêrazorê tev li kongreyê bibin.




Li ser amadekariyên lidarxistina kongreyê, Jîndar diyar kir ku wan bi armanca avakirina meclis û hilbijartina endamên rêveber û endamên yekitiyê gelek civîn li dar xistine…*ANHA*

# Qonaxa Sêyemîn a Pêngava Azadiya Ocalan

Koordînasyona Kongreya Star Qonaxa Sêyemîn a Pêngava "Em ê Pergala Îmralî hilweşînin û bi Rêberê xwe re bi azad bijîn" ragihand.
Rêxistina Kongreya Star di 10'ê cotmeha 2017'an ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêngav dabû destpêkirin.
Pêngav li gorî du qonaxan bi rêve çû. Di çarçoveya qonaxê de çalakiyên cûr bi cûr hatin lidarxistin.
Rêxistina Kongreya Star, roja 5'ê Tebaxê bi daxuyaniyekî qonaxa sêyemîn a "Em ê Pergala Îmralî hilweşînin û bi Rêberê xwe re bi azadî bijîn" ragihand.
Daxuyanî bi amadebûna bi dehan endamên Kongreya Star li ber avahiya kongreyê ya taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo hate xwendin. Daxuyanî ji aliyê Koordînasyona Jin a Rêveberiya Xweseriya




Demokratîk Remziya Mihemed ve hate xwendin.
Di daxuyaniyê de wiha hate gotin "Ji 2011'an de tecrîdeke girankirî û bi hincetên ne di cih de li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatiye ferizkirin, hemû pîvanên navdewletî hat binpêkirin, gihişt asta ku destûr neda malbatê û parêzeran ku hevdîtinan bi wî re bikin.
Wekî Kongreya Star a Herêma Cizîrê tecrîda li ser Rêberê gelan, xwediyê projeya çareseriya Rojhilata Navîn şermezar dikin. Rêbertî sedemên kirîza Rojhilata Navîn diyar kir û rêbazên çareseriyê danî. Her wiha doza jin wekî doza sereke a civakê pênase kir û rêbazên çareseriyê peyda kir. Berdewama tecrîdê temenê aloziyê dirêjtir dike.
Ji bo rakirina tecrîdê û daxwaza azadiya rêbertî me rêzeçalakî organîze kirine. Ji baweriya me ya bi azadiya rêbertî û azadiya jinê em qonaxa sêyemîn a Pêngava 'Em ê pergala Îmralî hilweşînin û bi Rêberê xwe re bi azad bijîn' radighînin.
Di çarçoveya pêngavê de wê meş li seranserî herêmê werin lidarxistin, her wiha semîner li se fikrê Ocalan û bernameyên li ser ekranên televîzyonê li ser rola rêbertî di azadiya jin û biratiya gelan werin organîzekirin.
Em bang li gelê xwe û rêxistinên jinan dikin ku tevlî çalakiyan bibin û CPT jî bila erka xwe ya rakirinê tecrîdê pêk bîne."



## Hêviya vegera ser koka xwe bi tekoşîna şoreşgerî pêkane

Avesta AMARGÎ

Ez dixwezim bi gotina pêşiyan ya ku dibêje her giya li ser koka xwe şîn dibe dest bi vê nivîsê bikim. Civak, ferd û mirovahî dema ku di zanista xwe de be dikare wateyê bide jiyana ew bi destê xwe diafirîne. Keda mirovan ya ji bo xweşikbûna jiyana welatên xwe didin, her tim bûye çavkanî ji kesên, rewşenbîr, nivîskar, hunermend û tekoşeran. Jiyana mirovan, bi rastiya têkiliya bi hevrebûyînê hatiye xweşik kirin. Pakî, delalî, wekhevî, heskirin, exlaq, ked, dostanî, rêzdarî, bi hevrebûyîn, moral, bawerî û hêvî tev bi keda pîroz ya afrîneriya mirovan re peyda bûne. Bê yek ji van tewazina jiyana însan tê xirakirin. Ev nirxin, angu esasên lêkirina civakeke hebûna xwe bi wate dikêne. Ev taybetmendiyên ku me hîna jî kêm anîne ser ziman Jiyana mirovan dihune û dihêlê şêwa bigire. Welat, welatparêzî jî, van taybetmediyan di hindirê xwe de dihewîne. Pergala serdest di vê sedsalê de, cezayê herî mezin ku dide mirovan, wan ji xak, welat û koka wan qut dikê ye. Mirovahî weke topa ji qelekê biçe qeleya din lê hatiye. Ew top di dawî de yan tê qetandin an jî tê halekî wisa nema pê tê lîskandin. Dibe mînakekî gelekî çûrs be lê rastiya qêrîna îro mirovahî di wan deryayan de dide îfade dike. Deriya, bûne makîneya mirovan. Her roj bedanên însanan, di wan deriyayan têne hêrandin û berbi cihên nayên rizgarkirin ve diçin. Mirina ku ji bo mirovan weke çûyînekî watedar û pîroz dihate dîtin îro wateya xwe winda kiriye. Ji bo civakekê tişta herî dawî ji dest biçe îro di rêza yekemîn de ji dest diçe. Ew ji dest çûyîn mirina xwezayî an temam kirina temenê mirinê ye. Dema mirov li ser dîroka mirovahiyê dixwîne, dihizire û lêkolîn dike, qet rastî bê watebûyîna jiyana însan ya ku di vê demê de pê didin jiyan kirin nayê. Li hember vê rastiya bi êş û jiyana ne mafdar ku tê jiyan kirin Rêber APO, ji bo tevahî mirovahiyê bû heqîqetek nû derket ser dika dîrokê. Derketina Rêber APO, weke çirûskek ronahiyê hat ser sifra mirovahiyê. Rêberê gelan, Beriya her tiştî dest avêt koka jiyanê, angu jina êdî di halekî pêre nayê jiyan kirinê. Di rastiya xwe de, ji dest çûna jiyana mirovahiyê bi jina ji dest çûyî ve hate dest pê kirin. Lewma em karin bêjin îro rakirin û bilindkirina jiyana azad bi rakirina jinê dikare pêkan bibe. Jin û gelên tekoşer îro bedelan didin da ku carekî din nirxên jiyana mirov yên herî xwezî vegerînin. Felsefe û fikira Rêber APO xwe li ser hîmê jiyana rast bê jiyîn ava kiriye. Di nivîsandina vê hevokê de gotina Rêber APO hate bala min dibêje; "Ne girînge mirov dirêj jiyan bikê, ya girîng ewe tu çi li pişt xwe dihêlê ye." Ger jiyanekî bi wate neyê jiyan kirin, tiştên bi wate jî nayên hêştin. Gelê Kurd di dayîna tekoşîna ji bo mirovahiya azad, îro wateya jiyanê diafirîne. Tevgerên şoreşgerî, çawa ku di dîroka mirovahî de bûne hêviyên jiyana azad, îro tevgera azadiya Kurd jî bi rola xwe ya dîrokî radibe û çanda şoreşgerî û çanda berxwedêr di mirovên tekoşer de ava dike. Tevgera şoreşgerî û azadiyê ya Kurdistanê, îro mîrasa hemû şoreşan dihewîne nav felsefa xwe ya jiyanê û tekoşîna derxistina hemû rastiyan û gihîştina heqîqetan dide. Yekane rêya çareserkirina jiyana hatiye berovajî kirin derxistina rastiya civakeke şoreşgerî ye.

# Divê li dijî tecrîdê em rabin ser piyan

***Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan şert û mercên tecrîda li ser Ocalan nirxand û got, "Li Îmraliyê pêkanînên ku ji şert û mercên tecrîdê wêdetir hene. Ev rewş bi tu awayî nayê qebûlkirin û divê pêşî gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn ji bo ji holê rakirina tecrîda li Îmraliyê têbikoşin."***



Mihemed Ocalan xwest ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan neyê qebûlkirin û bikevin nava tevgerê. Ocalan hişyariya 'Dibe ku sibê dereng be' da.
Birayê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Mihemed Ocalan şert û mercên tecrîda li ser Ocalan nirxand û got heta niha serlêdanên wan nehatine qebûlkirin û hincetên wan ne rast in. Mihemed Ocalan ji Ajansa Mezopotamyayê (MA) re axivî û wiha got; "Li Îmraliyê pêkanînên ku ji şert û mercên tecrîdê wirdetir hene. Ev rewş bi tu awayî nayê qebûlkirin û divê pêşî gelê Kurd û bi giştî jî gelên Rojhilata Navîn hemû ji bo jiholêrakirina tecrîda li Îmraliyê bênavber têbikoşin."

### DIVÊ OCALAN ROLA XWE BILEYZE

Ocalan, diyar kir ku li Rojhilata Navîn gelek pirsgirêk hene û ji van pirsgirêkan a herî girîng jî doza Kurdan e û got: "Ji bo çareserkirina vê dozê eger dilê hêzên serdest hebe, nexwe divê rêyên hevdîtinê ya bi Ocalan re bên vekirin. Tenê Ocalan dikare vê pirsgirêkê çareser bike. Ji bo Ocalan rola xwe bilîze, divê şert û merc bên başkirin."

### DILÊ KURDA LI ÎMRALIYÊ YE

Ocalan, destnîşan kir ku guh, çav û dilê gelê kurd li Îmraliyê ye û got: "Çav, guh û dilê gelê Kurd li Îmraliyê ye. Êdî gel li benda gotineke li wir in. Her diçe ev hêviya gel jî tune dibe. Tunebûyîna hêviya gel tê wateya ku Tirkiye û Rojhilata Navîn ber bi rêyeke ku vegera wê tune ye diçin."

### DIBE KU SIBÊ DERENG BE

Ocalan herî dawî got, "divê siyasetmedarên kurd û gelê Kurd ji bo jiholêrakirina tecrîda li ser Rêberê xwe bi awayekî zêde tevbigerin û divê siyasetmedar bêtir siyaseta xwe têkildarî tecrîda li Îmraliyê bikin." Ocalan, bilêv kir ku bi tu awayî nayê qebûlkirin ku Ocalan derî rojevê bê hiştin û wiha dewam kir; "Divê gelê Kurd demildest rabe ser piyan. Eger ev yek îro çênebe wê sibê pir bi dereng bikeve. Em kor, kerr û lal kirin. Divê ev yek neyê qebûlkirin. Bi xwe ji bo vê yekê berdêl çi dibe bila bibe amade me ku bidim. Divê tu kes ji bêrdêldayînê netirse û heta tecrîda li Îmraliyê ji holê ranebe divê bênavber têbikoşin."

# Bêdengî qebûlkirina dagirkeriyê ye

Nivîskar Enwer Elman diyar kir ku bêdengiya hikûmeta Herêma Kurdistanê li hember dagirkeriya Tirkiyê tê wateya qebûlkirinê û got; "Ji ber lewazbûna fikra netewî, di nava Kurdan de xiyanetkar hene."
Nivîskarê Kurd li Elmanya Enwer Elman derbarê dagirkeriya dewleta Tirk li ser xaka Başûrê Kurdistanê û bêdengiya hikûmetê de axivî û diyar kir ku bêdengî tê wateya qebûlkirinê.
Enwer Elman diyar kir ku timî dijminên Kurdan ji bo berjewendiyên xwe hevdû girtine, dijî Kurdan şer kirine û wiha dewam kir; "Tirkiye jî sûdê ji vê digire. Ger bipirsim çima hikûmeta Iraqê û Herêma Kurdistanê li hemberî dagirkeriya Tirk li ser Başûrê Kurdistanê bêdengin? Ji ber ev bê helwestî tê wateya qebûlkirina dagirkeriyê."
Elman bal kişande ser hebûna baregeh û navendên leşkerên Tirk li herêma Behdînan û got; "Ev herêm dibin kontrola PDK'ê de ye. Sedema destûrdanê, ji ber berjewendiyên li gel dewleta Tirk e. Kurd ketine ber metirsiyên navnetewî. Kurd bi xwe jî ne yekgirtî ne. Ger yek bin, dikarin li hemberî hemû êrîşan rawestin."
Elman diyar kir ku divê Kurd ji



bo fikra netewî werin amadekirin. Elman got; "Niha fikra netewî tam nehatiye famkirin û lewaze. Ji bo wê em dibînin xiyanetkar û xwefiroş hene."…***ROJNEWS***

# Ji bo vegera 5 milyon koçberan komîte hate avakin

Rêveberên Sûriyê, di encama hewldanên Rûsyayê de ji bo vegera nêzî 5 milyon koçber, komîteya hikûmetê ava kir.
Li gorî nûçeya di ajansa SANA ya fermî ya Sûriyê de hatî parvekirin, hikûmeta Beşar El Esed, ji bo vegera koçberên derveyî welat komîteya bê avakirin erê kir.
Di belavokê de hate gotin ku ji bo vegereke bi hêsan a 'Dostaniya bi welatan re' wê hevdîtin bên zêdekirin. Li gorî Neteweyên Yekbûyî, nêzî 5,6 milyon Sûriyeyî di rewşeke koçber de ne.
Rûsya ya bi Sûriyê re di nava îtifaqan de ye, meha borî di nava civaka navnetewyî de ji bo vegera koçberên Sûriyeyî banga alîkariyê kiribû.
Serok Dewletê DYA'yê Donald Trûmp û Serok Dewletê Rûsya Vîlademîr Pûtîn, li Helsînkiyê mijar gotûbêj kiribû û hatibû ragihandin ku Neteweyên Yekbûyî tevlî vê civînê nebibû.
Komîteya di bin serokatiya Serokê Rêveberiya Xwecihî û Derdorê Huseyîn Mahlûf de, wê ji gelek wezîr û nûnerên rêxistinên dewletan pêk were.
Li gorî SANA'yê avakirina komîteyeke fermî, wê rê li ber vegereke bi ewle ya welat veke.
Li gorî Komîseriya Bilind a Koçberan a NY'yê, di nava 6 mehên destpêkê ya îsal de, 13 hezar koçber vegeriyane Sûriyeyê. Têkildarî bê ka çawe vegeriyane agahiyên zelal nehatin parvekirin. Li qadên ku ji aliyê komên çete û dewleta Tirk ve hatine dagirkirin jî, malbatên çeteyan hatine bicihkirin.

# YPG li dijî leşkerkirina zarokan e



Nûrî Mehmûd li ser rapora Human Rights Watch destnîşan kir hêzên wan li dijî bi çekirina zarokan e û diyar kir ku rapor ne di cih de ye. Nûrî Mehmûd diyar kir ku ew amade ne bi kesên ku hewl didin rastiya li herêmên bi belge bikin, bibin alîkar.
Berdevkê Fermî yê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) Nûrî Mehmûd derbarê rapora Human Rights Watch ku îdia dikir YPG'ê zarokên kampên koçberan bi çek dike axivî. Nûrî Mehmûd got, "Human Rights Watch rewşê ji nêz ve baş naşopîne, tenê rewşa li herêmê bi yek partiyê ve girêdide. Tevî ku gelek rêxistin û hêzên siyasî û şoreşgerî hene, lê tiştê ku di raporê de hatiye gotin şaştiyeke mezin e."
Mehmûd anî ziman ku ji destepêka damezirandina YPG'ê ve tevlêbûna kesên bi temenê biçûk de hebû û got, "Belê ev tişt ji aliyê hin fermandar û şervanên me ve dihat kirin, lê ne li gorî rêziknameya me ye. Em li dijî vê yekê ne, me kesên biçûk li malbatên wan vedigerandin. Belgeyên vê yekê li gel me hene û em dikarin ji çapemeniyê re ragihînin."
Nûrî Mehmûd destnîşan kir ku fermandarên ku zarok tev li yekîneyê dikirin hesab ji wan dihat xwestin û ev tişt anî ziman, "Dibe ku heya niha em negihiştibin encamê, lê xebata me berdewam e da ku vê radeyê di nava yekîneyê de ji holê rakin. Em li gorî belge û biryarên navdewletî yên girêdayî Neteweyên Yekbûyî tevdigerin."
Mehmûd got, "Tevî ku me şert û merc ji bo serdana rêxistina navdewletî peyda kiriye, lê heya niha me ew rêxistin li herêmê ne dîtine. Mecal vekirî ye da ku werin herêmê û her tiştî ji nêz ve bişopînin. Nêzîkatiyên rêxistinên navdewletî divê nêzîkatiyên ser bixwe be, ne yek alî be. Li vir em bi bîr bînin ku ev rêxistinên navdewletî divê erka xwe ya li hemberî ji sedî 40 ji niştecihên Sûriyê yên ku koçî herêmên me bûne bi cih bîne, wan rêxistinan heya niha erka xwe bi cih bi aniye"
Berdevkê Fermî yê YPG'ê Nûrî Mehmûd di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku rapora rêxistina Human Rights Watch xwe dispêre kesên ne li herêmê, ew kesên ku agahî dane rêxistinê cihê gumanên ne û rastiya wan nîn e û got, "Deriyê me ji her kesî re vekiriye, em amade ne pêwîstiyên wan bi cih bînin û alîkariyan bikin da ku rastiyan nas bikin."…***ANHA***

# MSD'ê bersiva rapora HRW'ê da

Desteya Rêveber a MSD'ê li ser rapora Rêxistina Mafên Mirovan a Human Rights Watch ku tê de idia dikin, Yekîneyên Parastina Gel, zarokên kampan dike leşker, bersîva da û wiha got:" tiştên ku di rapora rêxistinê de hatine gotin, ew ê lêkolînan li ser vê idiayê bikin.
Daxuyaniya Desteya Rêveber a MSD'ê wiha ye :
"Di 3'yê Tebaxa 2018'an de Rêxistina Mafê Mirovan HRW'ê a Buroya Beyrûtê daxuyaniyek çepemenî li ser malpera xwe ya fermî belav kiribû. Rêxistinê di raporê de idia dike ku tîmek girêdayî rêxistinê hevdîtin bi 8 malbatên ku li 3 kampên cude dimînin-li gorî idîaya wan- gotin ku Yekîneyên Parastina Gel zarokên koçberan dike leşker.
Em weke Desteya Rêveber a MSD'ê hemû peymanên navdewletî yên girêdayî mafên mirovan ên giştî û bendên mafên zarokan û bi taybet benda tevlêkirina wan di şerên leşkerî de bi cih tînin, ew ji rêgezên bingehîn ji peymana siyasî ya Kongreya Damezrîner a meclisê ye. Li ser wê sedem û hêncet çi dibin bila bibin em li dijî leşkerkirina zarokane.
Em tekez dikin ku tiştên di rapora çepemanî ya rêxistinê de hatine gotin, emê lêkolînan li ser vê idîayê bikin û zarokên ku hatine leşkerkirin bi lez eger hate isbatkirin vegerînin malbatên wan û her wiha hesab ji kesên ku bûn sedema vê yekê bixwazin.
Ji ber wê em bang li rêxistin û saziyên navdewletî dikin ku ji bo xebatên mirovî bi MSD'ê re di nav danûstandinan de bin ta karibin pirsgirêk û tiştên ku şaş hatine naskirin derbas bikin.
Her wiha em tekez dikin em ê rêgezên mafên mirovan, zarok û jinê bi cih bînin. Û em ji bo danûstandin û hevkariyê bi hemû kesên ku doza mirovan nas dikin re vekirîne."



# Xayîn bê ceza namînin: Ajan hat kuştin

***Çalakiyên şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê li dijî xayîn, çete û dagirkeran berdewam dikin. Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê bi daxuyaniyekê ragihand ku wan xayînê bi navê Ekaş Hecî Ehmed ku sixûrtî ji dijminre dikir li gundê Dêr Sewanê kuştine. Odeya Çalakiyan careke din bang li kesên xayîn kir ku dev ji xuyanetê berdin.***




Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê ragihand ku ajanê dagirkeriya Tirkiyê "Ekaş Hecî Ehmed Elî" li gundê Dêr Sewan ê Efrînê hate kuştin.
Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê derbarê mijarê de daxuyanî da.
Daxuyanî wiha ye;
"Ji roja yekemîn a dagirkirina herêma Efrînê ji aliyê Tirkiyê ve me ew kesên ku wekî xayîn û ajan li kêleka Tirkiyê li dijî gelê me kar dikirin hişyar kirin.
Di demên dawî de, dagirkeriya tirkiyê çalakiyên xwe yên ajan û sîxuran zêde kirin da ku bighêjin armancên xwe.
Piştî şopandina tevgera xayînê bi navê "Ekaş Hec Ehmed Elî sala 1976'an de ji dayik bûye ku ji endamên meclisa xayînan a ku ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve hate avakirin e, hêzên me li gundê Dêr Sewan kemînek jê re danîn û hate kuştin.
Ajan "Ekaş Hecî Ehmed" tevlî malbata xwe beşdarî nava leşkerên artêşa Tirk a dagirker bûn dema ku gundê Dêr Sewan dagir kirin û wekî delîlê hêzên dagirker li herêmê xebitî, ji ber wan bi dehan sivîlên Efrînê hatin revandin û hîna çarenûsa wan ne diyar e.
Ekaşê xayîn peyam ji gelê me yên li derve re dişand û ew tehdîd dikirin ku eger vegerin wê werin kuştin.
Ji ber kiryarên wî, wekî Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê careke din em xayîn û ajanan hişyar dikin û bang li wan dikin ku xeta çetetî û îxanetê berdin. Em tekez dikin ku bi berxwedaniya gelê me wê dagirkerî têk biçe. Ew tenê mîna kaxezek lîstokê di destê dagirkeran de ne, kengê bixwazin wê werin şewitandin. Li ser vê yekê li şûna ku li hêviya mirinê û heqaretê bin dev ji îxanetê berdin.
Careke din em soz didin gelê xwe ku em ê dilopa xwîna her şehîdekî xwe û her sivîlekî ku rastî destdirêjiya dagirkeran û ajanên wan hatin hilînin. Efrîn, sebir bike, tolhildan tê."

# 100 şervanan dewreya xwe bi dawî kir



Hêzên Sûriya Demokratîk di Akademiya Şehîd Cuma El-Nezal de dewreya 100 şervanên nû yên ciwanên bajarê Tebqayê û gundewarên wê bi navê Dewreya Şehîd Ela Xelîfê bi merasîmekê bi dawî kir.
Di çarçoveya birêxistinkirina ciwanên herêma Tebqayê de û ji bo pêkanîna parastina rewa, Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) di Akademiya Şehîd Cuma El-Nezal de dewreyeke nû bi navê Dewreya Şehîd Ela Xelîfê ji 100 ciwanên Tebqa û gundewarê wê re bi merasîmekê bi dawî kir. Di merasîma bidawîkirina dewreyê de endamê Fermandariya QSD'ê Rojda Felat, hevserokê Meclisa Rêveber a herêma Tebqayê Şiyar Mihemed, hevserokê Komîteya Parastinê Mihemed Elî Xalid û hejmareke fermandar û nûnerên saziyên sivîl ên Reqayê beşdar bûn.
Di merasîma leşkerî ya ku hat lidarxistin de Endamê Rêveberiya Akademiya Şehîd Cuma El-Nezal, Şiyar Hesen bidawîkirina dewreyê li hemû ciwanan pîroz kir û wiha got: "Em bi hêvî ne ciwanên ku dewreya xwe bi dawî kirine tişta ku di dewreyê de wergirtine di merîyetê de pêk bînin û ji bo parastina ewlehiya herêmê bi berpirsyarî tev bigerin."
Dewre 25 rojan dewam kir û tê de ciwanan waneyên bîrdozî yên wekî rêgezên demokrasiyê, şerê taybet, dîroka jinan, dîroka Rojhilata Navîn wergirtin. Di dewreyê de her wiha waneyên leşkerî yên cur be cur hatin dayîn…***ANHA***

# Bazariyên ji bo avakirina hikûmeta nû

Li Iraqê piştî hilbijartina di 12'ê Gulanê, ji bo avakirina hikumeta nû bazarî tê kirin.YNK'ê namzetê xwe yê serokkomariyê eşkere kir û taloqkirina hilbijartinên herêmî di rojevê de ye.
Li Iraqê nêzî 3 meh ji ser hilbijartina di 12'ê Gulanê de derbas bû lê ji bo avakirina hikumeta nû, hê jî hevdîtin tên kirin. Lîsteya Mûktada Sadir Saîrûn ê Şîî yê ku di hilbijartinê de bi ser ketibû, bi gelek lîsteyan re têkiliyê datîne. Koalîsyona Fetîh a ku Hadî Samîrî li ser wê yê ku Haşdî Şabî ava kiriye, ji bo xebatên hikumetê kete dewrê.
Berdevkê Koalîsyona Fetîhê, Ahmed Esadî diyar kir ku ji bo avakirina hikumetê wan gelek hewldan dane destpêkirin û ji bo îlankirina hikumetê ya bi koalîsyoneke mezin ew li benda encamên fermî yên hilbijartinê ne. Esadî got ku, "Ji bo bernameya avakirina hikumetê, di çarçoveyeke neteweyî de me dest bi diyalog û hewldanan kir. Di vî warî de pêşketin çêbûne. Bernameya koalîsyona Fetîhê ji aliyê gelek aliyên siyasî hate qebûlkirin."
Esadî qala naveroka hevdîtinan nekir lê di nav kûlîsan de tê gotin ku namzetê seroktiyê yê Koalîsyona Fetîhê Nûrî Malîkî ye. Ji ber ku Malîkî nêzî Îranê ye, DYA li dijî wî ye. Tê gotin ku heke formul ev be, ew ê alozî çêbibe.
Koalîsyona Nasir jî bi aliyên siyasî re rûnişt û dixwaze ku Haydar Abadî dîsa were hilbijartin. Lê vê pêşniyaza Koalîsyona Nasir nehate qebûlkirin.

### NAMZETÊ YNK'Ê YÊ SEROKKOMARIYÊ

Li eniya Iraqê xebatên ji bo avakirina hikûmetê didomin, hate diyarkirin ku YNK piştî ku hikûmet hate hilbijartin namzetê xwe yê ji bo Serokkomariyê diyar kiriye.
Hê tam diyar nebûye lê li gorî nûçeya di malpera fermî ya YNK'ê PUK Medyayê de ji bo erka Serokkomariyê navê Mihemmed Sabir Îsmaîl derbas dibe. Çavkaniyên nêzî YNK'ê dibêjin îhtimale ku namzet were guhertin, lê navê niha derdikeve pêş Sabir Îsmaîl e.

### LI BAŞÛR NEDIYARBÛNA HILBIJARTINÊ



Li Herêma Federal a Kurdistanê jî nediyarbûna siyasî heye. Li başûrê Kurdistanê diviyabû hilbijartin Nîsana borî bihata kirin lê ji bo hilbijartin di 30'ê Îlonê de pêk were parlamento û hikûmetê biryar girt. Partiyan li gorî vê rewşê amadekariyên xwe kirine. Partî û lîsteyan namzetên xwe radestî desteya hilbijartinê kirin. Lê di nava vê hefteyê de gote gotên ku hilbijartin wê salek din bê taloqkirin, belav bûne.
Di serî de Tevgera Goran, Nifşê Nû û gelek partiyên din ji bo hilbijartin di dîroka hatî diyarkirin de bê kirin daxuyanî dan. Lê heta niha ne PDK û ne jî YNK'ê têkildarî hilbijartin di demê xwe de bê kirin ti daxuyanî nedane. Endamê Ofîsa Ragihandinê ya YNK'ê Azad Tofîk têkildarî hilbijartinan îdîayek din avêt holê. Li gorî Tofîk rojên derbasbûyî ji bo avakirina hikûmeta nû ya Iraqê Nûnerê Taybet yê dijî Têkoşîna DAIŞ'ê yê DYA Brett McGurk hevdîtin çêkir û piştre li Hewlêrê bi Barzanî re civiya û daxwaz ji Barzanî kir ku hilbijartinên 30'ê Îlonê paşve bixe. Tofîk got Brett McGurk bûyerên li Iraqê diqewimîn weke sedem nîşan da û daxwaza paşvexistina hilbijartinê kiriye.

# Îran wê timî di hedefê de be

Zekî BEDRAN

Hîlala Şîî ji aliyê DYE û Îsraîl ve tê dorpêçkirin. Ev polîtîkaya tengav kirin û tepisandinê niha li ser Sûriyê re tê kirin. Emerîka eniya li dijî Îranê dihûne û bandora xwe zêde dike. Li Rojhilatanavîn Erebîstana Siûdî û gelek welatên kendavê di nava vê eniyê de ne. Hewl tê dayîn ku li Iraqê hêz û partiyên ku nêzîkî Îranê ne nebin desthilat. Tirkiye wê çiqas di nava vê eniyê de cih bigire, ew jî nêzîkatiyên Emerîka û hevalbendên wê yên li dijî Kurdan wê diyar bike. Tirkiyê her dem Îran tevlî îtifaqên li dijî Kurdan kiriye. Sala derbasbuyî li dijî hewldana Barzanî ya referandûmê Tirkiyê bi lez bi Îranê re hevkarî kir. Helwesta Tirkiye a ku xwe nêzîkî DYE bike an jî ser girtî piştgiriyê bide Îranê, wê nêzîkatiyên ji pirsgirêka Kurd re diyar bikin. Ger Tirkiye li dijî PKK'ê û li dijî hemû Kurdan piştgiriya Emerîkayê bigire wê di eniya li dijî Îranê de cih bigire. Ji ber ji bo Tirkiyê ji derveyî Kurdan niha mijareke sereke tune ye. Ji xwe Tirkiye di eniya li dijî Îranê de ye. Ji be Tirkiye serkêşiya eniya Sunî, Îran jî serkêşiya eniya Şîî dike. Li herêmê du dewlet di nava rikberiyê de ne. Lê dema ku Kurd dibin mijara gotinê tên cem hev. Îran û Tirkiye naxwazin li herêmê sazîbûna netewe-dewletê biguhere. Her du dewlet jî di rewşeke gelek hişk û dogmatîk de ne.
Îsraîl, dema ku li dijî DAIŞ'ê şer berdewam dikir gelek bê deng bû. Ya balkêş jî, Îsraîl û DAIŞ qet dest nedan hev. Dema ku DAIŞ li Sûriyê têk çû Îsraîl li dijî Îranê ket nava tevgerê. Daxuyakirin ku wê li baregehên Îranê yên li Sûriyê bixe û wê destûrê nede ku li Sûriyê bi cih bibe. Dema ku xwest jî êrîşî Sûriyê kir. Qasî ku tê fêhmkirin Îsraîlê li dijî Îranê bi Rûsya û Emerîka re li hev kiriye. Lewra li hember êrîşên hewayî yên Îsraîlê Rûsyayê ti helwestek nîşan neda. Îsraîlê eşkere kir ku ew li dijî mayîna Esed ya li ser desthilatiyê nîn in. Xwesteka Îsraîlê rêveberiyeke Esed ya lewazbuyî ye. Gotin, bila Îran ji dewrê derkeve û sed kîlometre nêzîkî sînorê Îsraîlê nebe. Tê fêhmkirin ku Rûsya ev yek jî qebûl kiriye.
Hîzbullah û Îran du hêzên ku li dijî DAIŞ'ê bi çalak şer dikirin. DAIŞ tenê bi piştgiriya hewayî ya Rûsyayê tune nebû. Van her du hêzan berdêla şer dan û niha jî ji wan re dibêjin oxir be. Rûsya jî dixwaze ku tesîra Îranê li Sûriyê kêm bibe. Rûsya dixwaze bi tena serê xwe li Sûriyê bibe hêza diyarker. Dizane ku Emerîka ne li dijî wê yekê ku Rûsya li şûna Îranê bi tesîr be. Bi Îsraîlê re li ser hev hevdîtin pêk anîn. Tê fêhmkirin ku Emerîka û Rûsyayê li Sûriyê li ser mijarên sereke lihevkirine. Emerîka û Rûsya timî nikarin di nava pevçûnê de bin. Berjewendiyên wan cuda ne lê mijarên ku li ser lihevbikin jî wê hebe.
Zêlal nîne bê Sûriye wê çawa were ava kirin. Lê ya zelal ew e ku Emerîka, Rûsya û hêzên ku li cem wan xwedî projeyeke demokrasiyê nîn in. Ti pirsgirêkekî wan û mijareke wan ya sereke bi vî rengî tune ye. Her tişt li gor berjewendiyên wan û tesîra wan ya ku li ser herêmê bê avakirin e. Girînge ku mirov bizanibe her dem û fersendê de dikarin li dijî gelan lihevbikin. Îran jî di nav vê de ye. Ti polîtîkayeke Îranê ya demokratîkbûna herêmê tune ye. Destwerdana Îranê ya li herêmê di eksena parastin û berdewamkirina desthilatiya xwe û sînorên xwe de ye. Ji ber wiha ye şansê Îranê yê ku piştgiriya gelên herêmê bigre tune ye. Ji xwe Îran pirsgirêkên gelên nav xwe jî çareser nake. Heta ku di hundur de demokrasî pêş nekeve, gel bi nasnameyên xwe bi azad nejîn, Îran wê tenê weke parçeyek ji şerên serweriyê bimîne û nikare bibe xwedî bandor. Ev jî ji bo Îranê xeteriyeke mezin e. Dema wiha bimîne derfetên ku îtîfaqên xwe mayînde bike namîne. Îran wê nîvenga rojhilatanavîn ya bi şer û parçekirî de bibe aliyek, bibe hedef û ji wê wêdetir nikare biçe. Ji bo Rojhilatanavîn û Sûriyê çareseriya herî mayînde çareseriya netewa demokratîke ku yekîtiya gelan esas digire. Hemû gel, çand û bawerî bibin yek ancax wê karibin destwerdanên derve û pevçûnên bi xwînî bi dawî bikin.